

<https://doi.org/10.35859/jms.2020.732530>

SÎSTEMA DÎYARKIRINA ZAYENDA NAVDÊRAN DI KURDÎYA KURMANCÎ DE*

Mehmet YONAT¹

PUXTE

Zayend di gelek qadên jîyana însanan de hêmaneke dîyarker e. Ziman jî ji wan qadan e ku zayend xwe di nav de nîşan dide. Xebatên zayenda di zimanan de li ser du mijaran kûr dibin; sîstemên rêkheftina zayenda navdêran û sîstemên dîyarkirina zayenda navdêran. Di vê xebatê de sîstema dîyarkirina zayenda navdêran di Kurdîya Kurmancî de bi awayeke sîstematîk hatîye analîzkirin. Xebatên li ser sîstema dîyarkirina zayenda navdêran di Kurdîya Kurmancî de gelek kêr in û yê heylî jî yan tatmînkar nînin an jî tenê li ser dîyarkirina zayenda navdêrên jîndaran sekinîne. Kêmasîya xebateke sîstematîk ya di vê qadê de bû sebebê vê gotarê. Di xebatên li ser zayendê de, nêrînên Corbett (1991) bingeh in ku di vê gotarê de jî ew nêrîn hatine şopandin. Di wê xebatê de hin pîvan hatine dîyarkirin bo dîyarkirina zayenda navdêran û di vê xebatê de jî ew pîvan ji bo Kurdîya Kurmancî hatine tetbîqkirin. Di encamê de, sîstemeke rêk û pêk ya sîstema dîyarkirina zayenda navdêran hatîye bidestxistin ku bi wê ve zayenda hemû navdêrên Kurmancî li ser mantiqekê dikare were danîn. Dîsa, di devokeke Kurmancî ya Qefqasyayê de navdêrên bi awayekî pirjimar kêşandî maruzê senifandineke cuda dibin ku li ser însanbûn û neînsanbûnê ava bûye. Ev senifandin jî di vê gotarê de hatîye analîzkirin.

Peyvên Sereke: Kurmancî, Sistema Dîyarkirina Zayenda Navdêran, Navdêrên Nêr, Navdêrên Mê, Navdêrên Cotzayend, Navdêrên Jîndaran, Navdêrên Nejîndaran.

* Bu çalîşma yazarın Türkçe yazılan "Kurmancî Kürtçesi Ağızları Hakkında Sosyolinguistik bir İnceleme" adlı doktora tezinden alınıp genişletilerek Kürtçe yazılmıştır.

¹ Dr., Mardin Artuklu Üniversitesi Kürt Dili ve Edebiyatı Anabilim Dalı

E-mail: mehmetyonat49mail.com

ORCID: 0000-0001-8576-7486

Article Type/Makale Türü: Research Article / Araştırma Makalesi

Received / Makale Geliş Tarihi: 05.05.2020 - **Accepted / Makale Kabul Tarihi:** 29.08.2020

Kurmancî Kûrtçesi'nde Cinsiyet Belirleme Sistemi

ÖZ

Cinsiyet insan hayatının birçok alanında belirleyici bir unsur olarak karşımıza çıkmaktadır. Dil de bahsedilen bu alanlardan birisidir. Dilde cinsiyet çalışmaları, cinsiyet uyum sistemleri ve cinsiyet belirleme sistemleri şeklinde iki alan üzerine yoğunlaşmaktadır. Bu çalışmada Kurmancî Kûrtçesi'nin cinsiyet belirleme sistemi sistematik bir şekilde incelenmiştir. Kurmancî Kûrtçesi'nde cinsiyet belirleme sistemi üzerine çalışmaların sayısı çok azdır. Var olan çalışmalar da ya tatmin edici boyutlarda değildir ya da yalnızca canlı isimlerin cinsiyetinin belirlenme sistemi üzerine yoğunlaşmıştır. Bu alandaki sistematik bir çalışmanın eksikliği bu makalenin oluşmasına sebep olmuştur. Corbett'in (1991) bu alandaki çalışmalarda temel alınan bakış açısı dildeki cinsiyet üzerine yapılan bu çalışmada da temel ölçüt olarak alınmıştır. İsimlerin cinsiyetinin belirlenme sistemine dair bahsi geçen çalışmada bazı kriterler belirlenmiş ve bu kriterler Kurmancî Kûrtçesi'ne uygulanmıştır. Çalışmanın sonunda Kurmancî Kûrtçesi'nin tüm isimlerinin cinsiyetlerini bir mantığa oturtan derli toplu bir cinsiyet belirleme sistemi elde edilmiştir. İsimler çoğul çelimplendiğinde insan olma – insan olmama kriteri üzerine dayanan bir isim sınıflandırma sistemi Kurmancî Kûrtçesinin Kafkas bölgesinde konuşulan bir altlehçesinde keşfedilmiştir. Bu sınıflandırma da elinizdeki makalede analiz edilmiştir.

Anahtar Kelimeler: Kurmancî, İsimlerin Cinsiyet Belirleme Sistemi, Eril İsimler, Dişil İsimler, Çift-Cinsiyetli İsimler, Canlı Varlık İsimleri, Cansız Varlık İsimleri.

Gender Assignment System In Northern Kurdish

ABSTRACT

Gender is a characteristic element in a range of areas of human life. Language is one of these areas in which gender appears. Gender studies specify on two topics; gender agreement systems, and gender assignment systems. In this article, gender assignment system in Northern Kurdish has been analysed systematically. Studies on gender assignment system in Northern Kurdish are limited and they are either far from satisfaction of the topic or they just focus on animate nouns assignment system. Deficiency of a systematical study on the topic leads to this study. The approach of Corbett's (1991) key source of gender studies has been followed in this article. In the Corbett's (1991) study, some criteria have been identified to assign nouns gender. In this study, these criteria have been applied to Northern Kurdish. What is acquired in the end of this article is a clear-cut gender assignment system which could rationalize all nouns of Northern Kurdish in terms of gender assignment. Last but not least, in a Caucasian sub-dialect of Northern Kurdish, It has been realised a different kind of noun's classification which is based on human-nonhuman criteria when a noun is inflected plurally. In this study, the mentioned classification has been analysed too.

Keywords: Northern Kurdish, Gender Assignment System, Male Nouns, Female Nouns, Double-Gender Nouns, Animate Nouns, Inanimate Nouns.

Destpêk

Têgeha zayendê di hemû civatên dinyayê de wek têgeheke girîng dertê pêşiya me. Lewra di hemû zimanên dinya de, peyamên bi zayendê re eleqedar bi rêyên cuda ve tene dayîn. Lê herçiqas bikaranîna zayendê di hin zimanên dinyayê de gelek berfireh be jî di hin zimanên din de gelek teng e. Hin ziman peyamên bi zayendê ve eleqedar, tenê di qada leksîkî de didin. Lê hin zimanên din yê dinyayê jî ev peyam hem di qada leksîkî de hem jî di qada rêzimanî de didin. Ev ziman navdêran li gor zayendên wan diseniffnin. Cureyên bêjeyan wek rengdêr, lêker, cînavk û hwd. dibe ku li gor zayenda navdêrê bi navdêrê re bikevin nav rêkkeftinê (agreement) (Haig, 2000: 2). Hebûna zayendê di zimanekî de ji bo axêverên wî zimanî hêsaniyan çê dibe. Mesela, zayend wê îmkânê dide ziman ku navdêrên wek hev tên nivîsîn lê me'na wan cuda ne, ji hev cuda bibin (Akin, 2005: 2). Mesela di Kurmancî de peyva "mal"ê eger di mena "cihê ku lê tê jîyîn" were bikaranîn wek *mê* tê nîşankirin (mala min), lê eger di mena "tiştên ku kesek xwedî ye" de were bikaranîn wê demê jî *-nêr* tê îşaretkirin (malê dinyayê).

Xebatên li ser zayenda rêzimanî hatîne kirin, li bin du sernavan tene senifandin; (1) xebatên ku li ser rêkkeftina zayendî ya navdêran bi beşên axaftinê re disekine (2) xebatên li ser sîstema dîyarkirina zayenda navdêran disekinin. Di vê xebatê de em ê li ser sîstema dîyarkirina zayenda navdêran ya di Kurmancî de bisekinin.

Di zimanekî xwedîzayend de bikaranîna zayendê pêvajoyeke otomatîk e. Lewra, wextê axêverekî zimanê zikmakî, zimanê xwe yê xwedîzayend diaxive, ji bo zayenda navdêran bîne bîra xwe tu hewlan nîşan nade. Yanê zayenda navdêran bi awayekî otomatîk tê bîra wî axêverî. Disa di xebatên li ser zayenda navdêran hatine kirin de pirseke din ev e ka gelo di dîyarkirina zayenda navdêran de tu zagon hene an na? Xebatên li ser zayendê yê ewil wek Bloomfield (1993: 280) îddîa kirine ku tu zagonên zayenda navdêran dîyar bike tunene. Lê xebatên pey wê bersivên erênîtir dane vê pirsê. Li gor van xebatên nûtir hin delîl hene ku nîşan didin zayenda navdêran li gor hin zagonan dîyar dibe. Delîl ev in; (1) Axêverên zimanekî yê zikmakî wextê zimanê xwe diaxivin tu xeletiyê di bikaranîna zayendê de nakin, (2) wextê ji zimanekî bîyanî bêje tene qerzkirin, ev qerzkirin li gor hin zagonan pêk tînin, (3) wextê bêjeyeke nû di zimanê xwedîzayenda rêzimanî de tê afirandin, hemû axêverên wî zimanî vê bêjeya nû bi heman kategoriya zayendê ve diseniffnin. Nexwe dikare were gotin ku axêverên zikmakî yê zimanekî xwedî zayend senifandina navdêran li gor hin krîteran dikin. Ji bo vê sîstemê jî "sîstema dîyarkirina zayendê" tê gotin (Corbett, 1991: 7).

Ji bo fêmkirina sîstema dîyarkirina zayendê di zimanekî de, divê nêrîn û fêmkirina jîyanê ya wê civatê were zanîn. Mesela, berîya ku xebatên bi hurgilî li

ser zimanê Anindilyakwa hatine kirin, dihate gotin ku sîstema dîyarkirina zayendê di vî zimanî de tesadûfî ye. Lê pey xebatên Worsley (1953-54) û Leeding (1989: 221-87) hate fêmkirin ku sîstema dîyarkirina navdêran di wî zimanî de li gor nêrîna jîyanê ya wê civatê şikil girtîye (Corbett, 1991: 29).

Zimanên xwedî zayenda rêzimanî dikare navdêran têxe nav herî kêma du û herî zede bîst senifan. Yanê hin ziman navdêran dixine nava du sinifan, mesela di Kurmancî de nêr û mê, û hinekên din jî navdêran dikarin ji dudu heta bi bîst awayî bisenifînin. Di gelek zimanên dunyayê de bi taybetî zimanên Hind-Ewrûpî de, navdêr li gor zayenda xwe ya bîyolojîk têne senifandin, loma ji bo senifandina navdêran bêjeya “zayend” (gender) hatîye bikaranîn. Lêbelê, senifandina navdêran tenê li gor zayenda navdêran ya bîyolojîk nayê kirin. Ji bilî krîtera zayenda bîyolojîk hin krîterên din jî hene ku hin zimanên dunyayê qîsmeke kêma ya van krîteran bi kar tînin û hinên din qîsmeke zêde ya van krîteran bikar tînin. De La Grasserie (1898: 614-15) di xebata xwe ya berfireh de, krîterên senifandina navdêran li bin heft serenavan dabeş kirîye;

Jîndar - Nejîndar (animate/inanimate)

Bimantiq - Bêmantîq (rational/non-rational)

Însan - Neînsan (human/non-human)

Însanên Nêr – Yên Din (male human/other)

Biquwet – Lawaz (strong/weak)

Mezinkirî - Piçûkkirî (augmentative/diminutive)

Nêr – Yên Din (male/other)

Nêr – Mê - Bêzayend (masculine/feminine/non-sexed)

Corbett (1991) du krîterên din jî li van krîteran zêde kirine; (1) krîter li jorê hatî behskirin, di hin zimanan de dibe ku bi hev re werin bikaranîn û krîterên nû derxine meydanê. Mesela, di hin zimanan de hem senifandina însan – neînsan heye û hem jî senifandina “nêr – yê din” heye. Di encama yekbûna van herdu krîteran de krîtera Însanên Nêr – Yê din derdikeve meydanê. Krîtera duyem (2) jî ew e ku herçiqas di gelek zimanên dunyayê de *nêrtî* wek krîterê dîyarker derkeve pêşberî me jî di hin zimanan de *mêti* jî wek krîterê dîyarker xwe nîşan dide (Corbet, 1991: 30). Krîterên li jorê hatî behskirin, krîterên me’neyî ne ku ji bilî van krîteran krîterên şiklî jî hene. Yanê dibe ku hin gireyên li bêjeyan zêde dibin zayenda navdêran dîyar bikin. Wek gireya biçûkkirinê (diminutive) ku di gelek zimanan de navdêran dike mê (Corbett, 1991).

Beriya ku dest bi mijarê bête kirin bi awayeke kurtasî behskirina hebûna zayendê di Kurmancî de wê kêr bê. Di Kurmancî de navdêr li bin du zayendan tene senifandin; yê *nêr* û yê *mê*. Eger navdêr di rewşa tewandî yan jî rewşa bangkirinê de, yan jî di nav îzafeyê de wek yekjimar neyêne bikaranîn, di derbarê zayenda navdêrên kurmancî de tu agahî dest nakeve (Haig, 2000: 4).

Yanê, navdêr bi serê xwe û di rewşa rasterast de tu agahî di derbarê zayenda xwe de nadin. Dîsa cînav û rengdêrên zayend-dîyarker jî ji wan bêjeyan in ku derbarê zayendê de agahî didin. Eger em bikaranîna paşgirên zayendê yên kurmancî di nav tabloyekê de bidin wê wiha be (Tan, 2015; Bedîr Han û Lescot, 2004; Taş, 2013; Ekîncî, 2007; Adak, Aydın û yêr din, 2016; Samûr, 2012; Komxebata Kurmancîyê, 2016):

Tablo 1: Di Kurmancî de Paşgirên Zayendê²

	Rewşa Tewandî		Rewşa Bangkirinê	Îzafe	
	Dîyar	Nedîyar		Dîyar	Nedîyar
Nêr	-î	-î	-o	-ê	-î
Mê	-ê	-ê	-ê	-a	-e/-a

Ji bilî paşgirên zayendê cînav û regdêrên zayend-dîyarker jî di Kurmancî de derbarê zayenda navdêra refere lê tê kirin de agahî didin. Ev jî bi vî awayî ne:

Tablo 2: Cînav û Rengdêrên Zayend-Dîyarker

Zayend	Cînav û rengdêrên zayend-dîyarker
Nêr	vî / wî
Mê	wî / wê

Di vê xebatê de di serî de wê li ser çend taybetiyên bingehîn yên sîstema dîyarkirina zayenda navdêran bê sekinin. Ev taybetî, (1) bermayiyên me'neyî (Semantic Residue) û (2) serhevduvebûn (overlapping) in. Dû re, wê li ser sîstema dîyarkirina zayenda navdêrên Kurmancî bê sekinin. Di vê beşe de, pêşî wê sîstema dîyarkirina navdêran di bin du kategorîyan de bê senifandin; sîstema dîyarkirina navdêran ya me'neyî, sîstema dîyarkirina navdêran ya şiklî û ev ê bi rêzê jî bo dîyarkirina zayenda navdêrên Kurmancî werine bikaranîn. Paşê jî, wek

² Her çiqaş di Kurmancî de paşgira nedîyarîyê paşgira “-ek(-)” jî be lewra ev paşgir tu bandora xwe li ser zayendê tune û dîsa lewra ne ji paşgirên zayendê ne li vê derê de nehatine dayîn.

dawî wê li ser rêkkeftina zayendî ya navdêrên pirjimar hatî kişandin were sekinîn.

1. Çend Taybetiyên Bingehîn yê Sîstema Dîyarkirina Navdêran

Sîstema dîyarkirina navdêran di hin zimanan de pêvajoyeke kompleks e û di hinekê din de nîsbeten kêmtir kompleks e. Beriya ku dest bi terîfa sîstema dîyarkirina zayenda navdêran di Kurmancî de were kirin, hin taybetiyên ve sîstemê yê ku di gelek zimanên dinyayê de tene dîtin, were kirin wê ev mijar rihettir zelal be. Ev taybetî (1) bermayiyên me'neyî (Semantic Residue) û (2) serhevduvêbûn (Overlapping) in.

1.1. Bermayiyên Me'neyî (Semantic Residue)

Zagona “bermayiyên me'neyî” (Semantic Residue) ew tişt e ku navdêrên ku bi zagonên pozîtîf ve tene senifandin, dikevîne nav wê senifa zayendê ku bi zagonên pozîtîf ve tene dîyarkirin û navdêrên ku bi zagoneke pozîtîf ve nayêne senifandin jî dikevîne nav wê senifa zayendê ku di wî zimanê de ji bo vê senifê senifek heye. Mesela, Bedir Han û Lescot (2005: 67-68) derbarê sîstema dîyarkirina zayenda navdêran di Kurmancî de wiha dibêje; di Kurmancî de, navdêrên ku tiştên şênber yê tûj, bilind nîşan didin zayenda *nêr* distînin û navdêrên şênber yê kûr, qul an jî rast nîşan didin jî zayenda *mê* distînin. Ev herdu zagon zagonên pozîtîf in. Yanê, zagonek heye ku senifa zayendê nîşan dide. Lê hin navdêr hene ku bi tu zagoneke pozîtîf ve nikarin di nav senifeke zayendê de werin bicihkirin. Ev navdêr di nav gruba “bermayiyên me'neyî” (Semantic Residue) de cih digirin. Di Kurmancî de navdêrên bermayiyên me'neyî wek mê tene îşaretkirin. Ji bo vê Bedir Han û Lescot (2005: 60) dibêje, eger navdêrekê bi riyeke mantiqî (bi te'rîfa me bi zagoneke pozîtîf ve) ve nikaribe were terfîtkirin ew navdêr mê tene qebûlkin.

1.2. Serêkvebûn (Overlapping)

Zagona serêkvebûn ew tişt e wextê navdêrekê ji krîtereke pozîtîf zêdetir bi krîteran ve bê dîyarkirin, yanê wextê ev krîterên pozîtîf bavêjin ser hevdu, ji van krîterên pozîtîf ew krîtera pozîtîf tene hilbijartin ya ku ji hêla wê civakê ve bihêztir tene dîtin. Mesela, di Kurmancî de endamê laşê însanan dikevîne nav senifa zayendê ya *nêr*. Ev krîtereke pozîtîf e. Di vê rewşê de divê her endama laşê însanan *nêr* be. Dîsa, krîtereke pozîtîf ya din jî ev e ku di Kurmancî de tiştên bêhêz û bêparastin *mê* ne. Bêjeya “pişt” ew bêje ye ku di nêrîna jîyanê ya Kurmancan de bi van herdu krîterên pozîtîf ve dikare were senifandin. Yanê eger em bi krîtera pozîtîf ya ewil vê bêjeya “pişt” binirxînin, divê ev bêje *nêr* be lê eger em bi krîtera pozîtîf ya duyem ve vê bêjeyê binirxînin, divê ev bêje bibe *mê*. Di vê derê de ev herdu krîter ser yek ve bûne (Overlapping). Di encama vê serêkvebûnê de, di nêrîna jîyana Kurmancan de krîtera duyem zêdetir giran hatiye û ev bêje wek mê hatiye hesabandin. Divê ev jî bê gotin ku ev krîter cudahiyên zayenda navdêran ya di navbera devokan de heyî dikare heta

radeyekê te'rif bike. Yanê hin devok dikarin di encama serêkvebûnê de krîterekê hîlbijêrin û devokeke din jî krîtera din ya pozîtîf hîlbijêre. Mesela, di hin devokên Kurmancî de "mû" wek *nêr* û di hinan de jî wek "*mê*" tê bikaranîn.

2. Sîstema Dîyarkirina Navdêran di Kurmancî de

Zayenda navdêran di zimanan de bi du awayî dîyar dibin; bi agahiyên me'neyî (Semantic) yên navdêran û bi agahiyên şiklî (form) yên navdêran. Agahiyên şiklî yên navdêran di nav xwe de dibin du beş; agahiyên derbarê morfolojîya dariştinî ya navdêran û agahiyên derbarê fonolojîya navdêran (Corbett, 191: 7-8). Yanê, sîstema dîyarkirina navdêran bi agahiyên me'neyî yên navdêran û bi agahiyên şiklî yên navdêran ve tê bidestxistin.

2.1. Sîstema Me'neyî ya Dîyarkirina Zayenda Navdêran

Di zimanên xwedîzayend de me'na navdêrekê di dîyarkirina zayenda navdêrê de roleke gelek mezin hildigire. Ev rewş di hin zimanan de gelek bandordar e lê di hinekan de zêde bandordar nîne. Di dîyarkirina zayenda navdêrekê de bandortirîn taybetiya me'neyî ya navdêrekê ew zayenda bîyolojîk e ku bi wê navdêrê ve tê qestkirin. Lê aşîkar e ku piranîya navdêrên di zimanekî de nejîndar in û navdêrên nejîndar xwedî zayenda bîyolojîk nînin. Yanê navdêrên hebûnên nejîndar nikarin bibin nêr an jî mê. Loma ji bo dîyarkirina zayenda navdêrên nejîndar hin krîterên din hene. Yanê, gelo çima di Almanî de "Gabel" (çetel) mê ye, "Messer" (kêr) notr e û "Löffel" (kevçî) nêr e? Dîyarkirina van navdêrên nejîndar pêvajoyeke komplekstir e (Haig, 2000: 3-4).

Di Kurmancî de sîstema dîyarkirina zayenda navdêran bi piranî bi krîterên me'neyî ve derdikevin meydanê. Ji bilî krîterên me'neyî hin krîterên şiklî yên bi morfolojîyê ve eleqedar jî di dîyarkirina zayenda navdêrên Kurmancî de bandordar in. Ji bo dîyarkirina zayenda navdêran di Kurmancî de divê pêşî navdêr di nav xwe de wek yên jîndar û yên nejîndar werin senifandin. Paşê jî ev navdêr di nav xwe de wê werine senifandin.

1.1.1. Sîstema Me'neyî ya Dîyarkirina Zayenda Navdêrên Jîndaran

Navdêrên jîndar navdêrên însan û heywanan in. Di dîyarkirina van herdu grubên navdêran de sê hêman bandorê li ser dîyarkirina zayenda navdêran dikin. (1) Dîyarkirina zayenda navdêran bi awayeke leksîkî, (2) dîyarkirina zayenda navdêran bi awayeke referansî û (3) benda cudabûyîna zayendê.

a. Sîstema Leksîkî ya Dîyarkirina Zayenda Navdêran

Dîyarkirina zayenda navdêran bi awayeke leksîkî ew tişt e ku zayenda navdêrên jîndar ji bêjeyan xwe têne fêmkirin. Mesela, ji me'neya bêjeyên wek *bav*, *bira*, *ap*, *xal*, *zava*, *pîsmam*, *hevling*, *kal*, ... hwd. zayenda wan a rêzimanî tê fêmkirin.

Lewra ev navdêr jîndarên însan yê ji hêla bîyolojîk ve nêr nîşan didin û loma navdêrên nêr in. Heman tişt ji bo navdêrên însan yê ji hêla bîyolojîk ve mê jî derbasdar e. Wek, dê, xwîşk, jinap, jinxal, bûk, dotmam, jintî, dapîr, hwd. Ev rewş di navdêrên heywanan nîşan didin de jî heye. Mesela, navdêrên wek *conege, dîk, beran, hesp, nêrî, kopek, nêrekew, nêrker, ...* hwd. hem ji hêla bîyolojîk ve, hem ji hêla gramatîk ve û hem jî ji hêla leksîkal ve nêr in. Ji aliyê din ve, navdêrên wek *çelek, mirîşk, mî, mehîn, bizin, dêlik, mêkew, manker, ...* hwd. jî dîsa wek navdêrên berîyê hatî dayîn ji hêla bîyolojîk, gramatîk û leksîkî ve mê ne.

Di derbarê navdêrên jorê yê ji hêla leksîkî ve zayenda wan dîyar de du husus hene ku divê bêne zanîn. (1) Navdêrên însanan yê ji hêla leksîkî ve zayenda wan tê zanîn hema bêje bi temamî di navenda xwe de navdêrên nêr digirin. Yanê navdêrên nêr yê mervantîyê nîşan didin yê *wek ap, xal, bira, ...* hwd. ji bo formên van yê mê bingeh in. Weku, navdêra mê ya “jinap” ji navdêra nêr ya “ap”, disa, “jinxal” ji “xal”, “jinbira” ji “bira” tê çêkirin. Di Kurmancî de eksê vê rewşê mumkun nîne (Haig û Öpengin, 2014: 6). Yanê ji navdêra mê ya “met”ê navdêreke nêr wek “mêmet”^{*} nikare were çêkirin.

Hususa duyem (2) jî derbarê navdêrên heywanan de ye yê ku ji hêla leksîkî ve zayenda wan tê zanîn. Hin ji van navdêran ji bo nîşandana cureyeke heywanan tê bikaranîn wek, gur, ker, kewhwd. Ev wextê bi vê awayî têne bikaranîn zayendan wan yan di nav çarçoveya cotzayendî de tê nirxandin û bi awayeke referansî zayenda wan tê dîyarkirin³ yan jî bi hin pêşgir, paşgir an jî bêjeyan ve zayenda wan bi awayeke leksîkî tê dîyarkirin. Mesela, navdêra “kew” bi pêşgirên {mê-} û {nêr-} ve dibe “mêkew” û “nêrekew” û zayenda wê bi awayeke leksîkî dîyar dibe. Heman tişt ji bo bêjeya “ker”ê jî dikare were gotin ku ew jî dibe “manker” û “nêreker”.

b. Sîstema Referansî ya Dîyarkirina Zayenda Navdêran

Di Kurmancî de hin navdêr hem ji bo jîndarên nêr hem jî yê mê bînan bikaranîn. Mesela, *heval, xwendekar, mamoste, doxtor, xwarzî, birazî, ker, kew, şêr, piling, mişk*, hwd. ji van navdêran in. Ev navdêr her wekî tê dîtin hem navdêrên însanan hem jî yê heywanan in. Dîsa regdêr wextê wek navdêran têne bikaranîn ew jî ji bo du zayendan têne bikaranîn, wek, “delal”, “xweşik”, “çeleng”, “kurmî”, “beredayî”, ... hwd. Mesela, yek dikare ji yekê re hem bêje “delala min” û hem jî “delalê min”. Di ya ewil de kesa delal keseke jin e û ya duyem de kesê delal kesekî mêr e û bi vî awayî mînakên din jî dikarin werin bikaranîn.

Berîya behsa hurgilîyên vê beşê bê kirin, divê çarçova teorîk ya van navdêran bê danîn ku bi awayeke referansî zayenda wan dîyar dibe. Bedir Han û Lescot (2005: 69) navdêrên referansî wek navdêrên nêr qebûl kirine û ji bo bikaranîna

³ Li jêrê wê behsa dîyarkirina zayenda navdêran ya bi awayeke referansî û cotzayendîyê were kirin.

van navdêran ya bi awayeke mê jî îddîa kirine ku ev bikaranîna mê tenê ji hêla rêkkeftinê ve pêk tê. Lê Haig û Öpengin (2014) û Haig (2000) ev navdêr wek cotzayend⁴ terîf kirine. Yanê ev navdêr ne navdêrên nêr in ne jî yên mê ne. Li gor zayenda bîyolojîk ya jîndara ku nîşan didin, zayenda wan navdêran diguhere. Ji bo vê îddîayê jî Haig (2000: 9) du delîlên xwe hene: (1) navdêreke zimanekî eger di nav grubeke zayendê de hatibe senifandin mecbûr e rêkkeftinê bi wê zayendê ve bike. Yanê eger mesela bêjeya “heval” nêr be mecbûr e tenê rêkkeftina nêr nîşan bide. Lê “heval” hem rêkkeftina nêr wek “hevalê min” hem jî rêkkeftina mê wek “hevala min” nîşan dide. Argumenta duyem (2) ya Haig û Öpengin (2014: 7) jî kêmbûna nîşanên morfolojîk an jî fonolojîk yên ku zayenda navdêrên referansî nîşan didin. Yanê tu îşareteke morfolojîk an jî fonolojîk tune ku nîşan bide ka gelo “heval” navdêreke nêr e an mê ye. Lê mesela di Zazakî de ev îşaret hene. Bêjeya “heval” an jî “embaz” ji bo hevalên nêr û bêjeya “hevale” an jî “embaze” jî ji bo hevalên mê tê bikaranîn (Malmîsanîj, 2015: 67; Gruba Xebate ya Vateyî, 2013: 23; Bîngol, 2020). Dîsa Kerîmî (2019: 7) jî wek terîfa Haig (2000) û Haig û Öpengin (2014) terîfekê ji bo navdêrên cotzayend bikar anîye. Lê ew bêjeya *navdêrên mobil* li navdêrên cotzayend kirîye.

Navdêrên cotzayend yan jî yên referansî her wekî me li jor got, divê pêşî li bin du gruban werin senfandin; (1) Navdêrên însanan û (2) Navdêrên heywanan. (1) Navdêrên însan, her wekî behsa wê hatibû kirin dişa li bin du gruban dikare were senfandin: (a) yên navdêr û (b) rengdêrên wek navdêr têne bikaranîn. (a) Yên navdêr bi piranî ji bo navên pişeyan têne bikaranîn wek, *doxtor, xwendekar, mamoste, karmend* hwd. ev navdêr jî di nav xwe de dibin du grub;

(I) navdêrên ku bi giranî refereyê zayendekê nakin

(II) navdêrên ku bi giranî refereyê zayendekê dikin.

Ji bo gruba (I); mesela, navdêra “heval” bi giranî refereyê zayendekê nake loma jî li gor navdêra refere dike zayenda xwe hildide. Wextê kesê refere lê tê kirin jin be wek “hevala min” û wextê kesê refere lê tê kirin mêr be wek “hevalê min” tê kişandin. Wextê zayenda refere lê tê kirin nedîyar be wê çaxê di nav çarçoveya nêrtîya gelenper (generic masculines)⁵ de wek nêr tê kişandin. Ji bo gruba (II) jî navdêrên “hemşîre” û “seyda” dikare wek mînak were dayîn. Her

⁴ Bêjeya cotzayend di bêrehemên behsa wan hatî kirin de wek “common gender” (zayenda gelenper), “double gender” (cotzayend), “multiple gender” (pir zayend) hatine dayîn. Em ê di vê xebatê de ji bo van bêjeyan “cotzayend” bikar bînin.

⁵ Nêrtîya Gelenper (generic masculines) ew tişt e ku wextê navdêreke cotzayend an jî cînavkeke rêkkeftina zayendî li ser tê xwîyanê (wî, wê, vî, vê) navdêrek nîşan bide ku zayenda wê nayê zanîn, wê çaxê ev navdêra cotzayend an jî cînavk wek nêr tê kişandin. Wek; “Zaroka kurd, kurd e. Diya wî kurd e, bapîrê wî kurd e (Haig, Öpengin, 2014a: 9).

çiqas mêr jî bikaribin bibin “hemşîre” û jin jî bikaribin bibin “seyda” lê wextê ev navdêr têne bikaranîn bi pîranî li gor wê zayenda bîyolojîk têne kişandin ku ew zayend vê pîşeyê bi giranî dike. Derbarê vê de McConnell, Cinet (2011: 11) dibêje, pîşeyên ku bi giranî ji hêla mêran ve dihatine kirin lê niha ji hêla jinan ve jî têne kirin, dibine sebebê tevlihevîyê di zayenda kesa/ê referebûyî de. Dîsa Haig û Öpengin (2014) ji bo nav navdêrên bi zayendeke bîyolojîk ve zeliqîne bêjeya “termên yekzayendî” (gender exclusive terms) bikar anîne. Mînakeke ji bo van navdêran di kilama Şakiro ya bi navê “Sînem” de derbas dibe ku wuha ye;

Lewra tu şêxê min î ez mirîdê te me,
Tu seydayê min î ez suxtayê te me (Şakiro, Sînem Heyran)

Li vê derê kesê kilam dibêje mêr e û xîtabê jinekê dike û ji jinîkê re dibêje “tu şêxê min î” û “tu seydayê min î”. Her çiqas di van hevokan de bêjeyên “şêx” û “seyda” refereyê jinekê bikin û divê rêkkestineke mê nîşan bidin jî, lê rêkkestin bi awayekî nêr e. Ji ber ku pîşeyên şêxî û seydatîyê ji hêla mêran ve bi giranî têne kirin, loma jî her çiqas kesê refere lê hatî kirin jin be jî rêkkestina nêr hatiye bikaranîn.

Gruba duyem ya navdêrên însanan yê refereyê du zayendan dikin jî ew navdêr in ku eslê wan rengdêr in. Mesela, delala/ê min, şêrê/a min, kevoka/ê minhwd. Zayenda van navdêran jî li gor sîstemekê dîyar dibe. Kesa/ê ku refere lê tê kirin eger were zanîn jixwe li gor wê tê kişandin. Mesela;

Nenas û xerîbê welatan ez im
Pepûkê serê koh û latan ez im (Tîrêj, 2015: 31)

Her wekî di vê rêzika Seydayê Tîrêj de tê xwîyanê, bêjeya “pepûk” hem dikare refereyê navdêreke nêr hem jî navdêreke mê bike. Lê di vê derê de Seydayê Tîrêj bi vê bêjeyê ve xwe nîşan daye. Loma jî rêkkestina nêr pêk hatîye.

Lê eger kesê refere lê tê kirin neyê zanîn wê gavê yan li gor nêrtîya gelemper tê kişandin, yan jî li gor taybetiya rengdêrê tê kişandin. Ji bo nêrtîya gelemper em dikarin vê mînakê ji helbesta Feqîyê Teyran ya bi navê “Ey Av û Av” bînin;

Bê rahet û bê sekne yî
Yan ‘aşiqê baxwê xwe yî?
Yan Şubhetê Qelbê me yî
Ji işqa kê natebixî (Sadînî, 2011: 111)

Di vê çarînê de bi bêjeya “aşiq” ve tiştê qestkirin esas av e û zayenda bêjeya “av”ê mê ye. Lê di çarçoveya nêrtîya gelenper de bêjeya “aşiq” wek nêr hatiye bikaranîn.

Ji bo taybetîya rengdêrê ev dikare wek mînak bê dayîn; eger em bêjeyên “egîd” û “delal” bi awayekî kesê/a refere lê tê kirin neyê zanîn bikêşin wê wiha be;

Li vî welatî egîd pir in. Elbet *egîdekî* wê rastê te were.

Li vî memleketî delal pir in. Elbet tu yê evîdarê *delalekê* bibî.

Di van mînakan de navdêrên “egîd” û “delal” ku eslê xwe de rengdêr in, bi giranî ji bo kîjan zayendê hatine bikaranîn bi wê zayendê re rêkkestîne danîne. “Egîd” bi piranî ji bo kesên egîd û mêr tê bikaranîn loma jî wek nêr û “delal” jî ji bo kesên xweşik ên jin tê bikaranîn loma jî wek mê hatîye bikaranîn.

Zayenda navdêrên cotzayend yê heywanan bi du awayî dîyar dibe. Yan zayenda wê navdêra cotzayend ya ku refere lê tê kirin dîyar e û li gor wê tê kîşandin, wek, “kera me” ji bo kera mê û “kerê me” ji bo kerê nêr tê bikaranîn; yan jî zayenda wê navdêrê ya ku bi navdêra cotzayend ve tê îşaretkirin nayê zanîn. Di vê rewşa duyem de zayenda van navdêran bi wan kirîteran ve tene dîyarkirin ku ji bo navdêrên nejinîdar tene bikaranîn.⁶ Mesela, wextê zayenda “şêr” û “kevok” neyê zanîn û di nav hevokekê de werin bikaranîn, lewra çima “şêr” hêzdar e, loma jî wek nêr tê îşaretkirin; wek “şêrê wehşî” û çima “kevok” hassas û rindik e, loma jî wek mê tê îşaretkirin “kevoka li ser darê”.

Tablo 3: Sîstema Referansî ya Dîyarkirina Zayenda Navdêran

Navdêrên Însanan	Navdêr	Navdêrên bi giranî refereyê zayendekê <i>nakin</i>	Zayenda navdêrê tê zanîn	Li gor zayenda referans lê tê kirin	Hevalê min Hevala min
			Zayenda navdêrê nayê zanîn	Li gor nêrtîya gelenper	Hevalê min Doxtorê min
	Navdêrên ji rengdêran hatî çêkirin	Navdêrên bi giranî refereyê zayendekê <i>dikin</i>	Zayenda pîşeyî		Seydayê min Sînem e. Hemşîra min Elî ye.
			Zayenda navdêrê tê zanîn	Nêrtîya Gelemper	‘aşîqê baxê xwe ...
		Zayenda navdêrê nayê zanîn	Li gor zayenda navdêrê	Egîdekî Delalekê	
			Li gor taybetîya rengdêrê		

⁶ Li jêrê wê bi berfirehê behsa van kirîteran were kirin.

Navdêrên Heywanan	Zayenda navdêrê tê zanîn	Li gor zayenda navdêrê	Kerê me Kera me
	Zayenda navdêra referêbûyî <i>nayê</i> zanîn	Krîterên zayendê yên navdêrên nejîndar	Şêrê jêhatî kevoka xweşik

Di vê tabloyê de senifandina zayenda navdêrên referansî hatiye kirin ku li jorê bi hurgili behsa wê hate kirin.

c. Benda Cudabûyîna Zayendê

Di gelek zimanên xwedîzayend de navdêrên jîndarên biçûk wek “dergûş” û “heywanên biçûk” muemela zayendî ya navdêrên din yên jîndar nabînin. Mesela di zimanê Zandeyê de, navdêrên mêran nîşan didin nêr û yên jinan nîşan didin jî mê têne îşaretkirin. Lê ji bo zarokan wê zayendê bi kar tînin ku ji bo zayenda heywanan tê bikaranîn (Corbett, 1991: 14-15). Gelo heta çendsalîyê zayenda navdêrên însanên biçûk û heta çiqas mezintîyê zayenda navdêrên heywanên biçûk di nav senifên însan û heywanên mezin de nayê senifandin? Bersiva vê pirsê li gor civatan diguhere. Ji bo vê benda dîyarbûna zayenda navdêrên jîndar bêjeya “benda cudabûyîna zayendê” (threshold sex-differentialbility) tê bikaranîn.

232

Ji bo “benda cudabûyîna zayendê” dibe ku ji Almanî jî mînak bê dayîn. Mesela, bêjeya ‘Mädchen’(Keçik) her çiqas navdêreke jîndarên mê be jî û divê zayenda wê mê be, lê zayenda wê notr e. Lê hin caran wek mê jî tê bikaranîn. Braun û Haig (2019: 2) vê rewşê bi faktora ‘emir ve terîf dîkin. Yanê eger “Mädchen” (Keçik) ji bo keçikên bi emir biçûk were bikaranîn wek notr û ji bo keçikên mezin were bikaranîn wek mê tê bikaranîn.

Di Kurmancî de “benda cudabûyîna zayendê” heye. Ev bend hem di navdêrên însanan de hem jî yên heywanan de heye. Ji bo navdêrên însanan bêjeya “dergûş” dikare wek mînak were dayîn. Di kilama Şakiro ya bi navê “Ferzende Beg” de ji bo vê rewşê mînak heye,

Asyayê digot Besrayê dardayê *dergûşa* milê te *lawîn* e

Tu bi destê *Elfesya* bîgrê ji navê derkeve here. (Yildiz û Taşkin, 2018: 72; Şakiro, Ferzende Beg: 4.38-4.41)

Di vê dere de her çiqas “dergûş” *lawîn* yanê kurik be jî lê “dergûş” wek mê hatiye kişandin. Dîsa navê dergûşê “Elfesya”ye ku ev nav navê mêran e.

Hin navdêr hem ji hêla leksîkî ve hem jî ji hêla rêkkeftina zayendî ve her çiqas di nav sînoren zayendekê de bin jî dikarin bi firehbûna meneyê ve ji bo zayenda din jî bêne bikaranîn. Her çiqas di Kurmancîya standart de ev rewş tine be jî, bi

taybetî di devoka Bohtan⁷ de mînaeke bi vî awayî heye. Mesela, bavek dikare ji keça xwe re bêje “kurê min”. Di vê derê de bêjeya kur hem ji hêla leksîkî ve û hem jî ji hêla rêkveftinê ve nêr e lê kesa refere dike mê ye. Sebebê vê bi me berfirehbûna me’neya bêjeya nêr a “kur” ber bi bêjeya cotzayend “ewlad” ve ye. Lê wextê me’ne fireh bûye, zayenda bêjeyê neguherîye.

Dibe ku *benda cudabûyîna zayendê* ne tenê ji bo navdêrên însanan lê ji bo navdêrên heywanan jî wek krîterek derkeve pêşberî me. Bedir Han û Lescot (2005: 65) wiha dibêjin; gelek navdêrên heywanan wek nêr û mê têne senifandin. Mesela “rovî” û “şêr” nêr lê “kew” û “qijik” mê ne. Di dîyarkirina zayenda navdêrên hewanan de biçûkbûn û mezinbûn jî krîterek e. Krîterên heywanên mezin li jorê hate behskirin, Heywanên biçûk jî lewra îşaretên derbarê zayenda wan ya bîyolojîk kêr in, yanê ji şiklê wan nêrtî an jî mêyîtîya wan nayê fêmkirin loma jî heywanên ji aliyê girseya xwe ve biçûk in bi piranî mê têne qebûlkirin. Lê di vê xususê de tiştêkê heye ku divê bête zanîn, hin heywanên biçûk ji ber hin krîterên din dikarin têkevîne nav senifa navdêra nêr. Di vê rewşê de krîtera serêkvebûna (overlapping) dibe sebeb ku ev navdêr nêr bêne qebûlkirin. Mesela, “mişk” her çiqas mê be jî “mişkê kor” wek nêr tê qebûlkirin. Lewra, “mişkê kor” heywaneke zerardar e û lewra tiştên xeternak nêr in, loma jî ew nêr têne qebûlkirin.

2.1.2. Dîyarkirina Zayenda Navdêrên Nejîndaran

Di zimanên xwedîzayend de pêvajoya dîyarkirina zayenda navdêrên nejîndaran li gor navdêrên jîndaran zehmettir e. Her wekî lêkolînerên wek Haig (2000: 11), Haig û Öpengin (2014: 60-61) û Blau û Barak (1999: 31) gotine dîyarkirina zayenda navdêrên nejîndaran di Kurmancî de pêvajoyeke tevlihev e. Li gor wan zayenda gelek navdêrên nejîndaran yê Kurmancî li gor sîstematîkekê nikare were dîyarkirin.

Xebatên li ser dîyarkirina zayenda navdêran di Kurmancî de bi piranî li ser navdêrên jîndaran hatine çêkirin. Xebateke ji xebatên herî girîng û ya ewil ya li ser dîyarkirina zayenda navdêran di Kurmancî de xebata Emir Djaledet Bedir Khan û Roger Lescot ya bi navê “Grammaire Kurde (Dialecte Kurdmanji)” ya di sala 1971an de çapbûyî ye. Di vê xebatê de hem li ser dîyarkirina zayenda navdêrên jîndaran û hem jî li ser yê nejîndaran sekinîye. Dîsa, Kurd (2011) bi awayeke berfireh lê ne bi awayeke sîstematîk li ser vê mijarê sekinîye.

Di vê beşê de wê krîterên dîyarkirina zayenda navdêrên nejîndaran yê di zimanên dinde hatî qebûlkirin bo Kurmancî jî bê tetbîqkirin. Ev krîter li bin heft serenavan kom bûne.

⁷ Li gor axêverê Behdînî Şehmûz Kurt di devoka Behdînî de jî ev rewş heye.

1. **Hişkahi û Bihêzbûn:** Hişkahi û bihêzbûn di zimanan de krîtereke dîyarkirina zayenda navdêran e. Mesela di zimanê Objibwayê de ev kirîtereke gelek girîng e. Dîsa ji hêz û hişkahiye çî tê fêmkirin ew jî girîng e (Corbett, 1991: 21). Ev fêmkirin li gor nêrina heyatê ya wê civatê diguhere. Di Kurmancî de jî ev krîtereke girîng e. Navdêrên hişk û bihêz nêr in û yê nerm û bêhêz mê ne. Mesela, *kevir, zinar, demir, çîya, hestî, şêr*, hwd.” navdêrên hişk û bihêz in lewra jî nêr in lê *xwelî, hirî, çemûr, ax, xezal*, hwd. jî navdêrên nerm û bêhêz in loma jî mê ne.
2. **Tiştên Erênî (Tiştên Bifayde):** Di Kurmancî de tiştên li gor civata Kurmancan wek erênî tene dîtin nêr û yê neyînî tene dîtin jî mê ne. Mesela, berhemên ji heywanan tene destxistin wek tiştên erênî dikarin bêne terîfkirin. Wek *mînak, şîr, mast, rûn, dew, to, penêr, goşt* hwd. Ji bo tiştên neyînî jî tiştên neyînî yê ji heywanan dertên dikarin wek *mînak* bêne dayîn; mesela, *rêx, bişgul, mîz*, hwd. Eger were pirsin, “gû” navdêreke neyînî ye lê çima nêr e? Bersiva wê bi krîtera “serêkvebûn”ê (overlapping) ve dikare were vegotin. Ev bêje her çiqas tişteke neyînî be jî di Kurmancî de bi piranî ji bo sixêfan tê bikaranîn. Ev rewş jî meneyeke hêzdarîyê li vê bêjeyê zêde dike ku li jorê hate gotin navdêrên hêzdar nêr in. Di encama serêkvebûna van herdu krîteran de krîtera duyem ya hêzdarbûyînê li ser ketiye. Loma jî wek nêr hatiye qebûl kirin.
3. **Bilindahî:** Tiştên bilind û mezin di Kurmancî de nêr û tiştên çal û biçûk mê ne (Bedir Han û Lescot, 2005). Mesela, *çîya, zozan, kaş*, hwd. mezin û bilind in loma jî nêr in û *deşt, çal, newal, herq, morîstang*, hwd. jî çal, rast û biçûk in loma jî mê ne.
4. **Perçe û Tevahî:** Têkilîya perçe û tevahîyê di gelek zimanan de xwe wek krîtereke dîyarkirina zayendê nîşan dide. Mesela di Almanî de navdêrên navên gruban nîşan didin dibin notr û navdêrên di nav wê grubê de ne mê ne. Wek *mînak*, “Instrument” (enstiruman) notr e lê “guitarre” (gîtar) mê ye. Dîsa, “Obst” (Meywe) notr e lê “Apfel” (sêv) mê ye (Corbett, 1991: 84). Ev rewş di Kurmancî de jî heye. Navdêrên navê grubê nîşan didin nêr in lê navdêrên endamên an jî perçeyên vê grubê ne, ew jî mê ne. Mesela, bêjeya “wext” nêr e lê bêjeyên *roj, şev, esir, sibe, duşem, payîz, zivistan, sal*, hwd. ku perçeyên gruba “wext” ne ew jî mê ne.⁸ Dîsa, bêjeya “bajar” nêr e lê endamên vê grubê yê wek “Dîyarbekir, Mûş, hwd.” mê ne. Dîsa “welat” nêr e lê “Kurdistan, Tirkîye, Almanya, Iraq, hwd.” mê ne. Malbata gîyayan

⁸ Di hin devokan de hin caran bêjeya “wext” an jî hem me’neyên wî “dem” “zeman” wek mê jî dikarin werin bikaranîn. Sedemê vê ew e ku “wext” û hem me’neyên wî eger bi me’neya gelenperî de were bikaranîn wek nêr tê bikaranîn lê eger di me’neyeke taybet de were bikaranîn wek mê tê bikaranîn. Mesela, “wextê wê derbas bûye” di vir de wext ne dîyar e loma nêr e lê “wexta tu hatî em çûn” di vê derê de jî wext dîyar e.

jî dikeve nav vê grubê. Jina Kurd (2001) dibêje; “Gîya jî malbatek heye, û gîha bi xwe serokê wê malbatê ye, zayenda gîyê nêr e. Lê gîyagelaşên mirov an ajal wan dixwin, zayenda wan mê hatiye; vê tuzikê, vê pûngê, vê sebanixê, ...”.

5. **Xeternakfî:** Di Kurmancî de navdêrên xeternak nêr in. Her wekî li jor behsa wê hatibû kirin hin navdêrên heywanan li gor krîterên navdêrên nejmîndar têne dîyarkirin. Mesela, “mişk” her çiqas biçûk be jî çima “mişkê kor” tişteke xeternak e ji bo çandîniyê loma jî wek nêr hatiye senifandin. Dîsa, “mêş” mê ye lê çima “moz” xeternak e wek nêr hatiye senifandin. “Cin”, “şeytan” çima tiştên xeternak û xirab in loma jî wek nêr hatine senifandin. Ev rewş di zimanên Ojibwa û Dyirbal de jî heye (Corbett, 1991: 24-25).
6. **Bêjeyên Dînî û Mîtolojîk:** Bêjeyên mîtolojîk di civatê de li gor rola hilgirtîye ser xwe tê senifandin (Corbett, 1991: 16). Ev rewş di Kurmancî de jî heye. Mesela, *Xwedê, pêxember, reb, ruh, qelb*, hwd. nêr in û *merhemet, riza*, hwd. jî mê ne.
7. **Têkiliya Tasawurî:** Li gor vê krîterê eger navdêrek bi navdêreke din re di nav têkilîyeke bihêz de be wê gavê zayenda wê navdêrê distîne. Di Kurmancî de jî ev krîter heye. Mesela, kincên ku însan li xwe dikin çima bi însana re eleqedar in loma jî nêr in, *wek, kinc, pantolon, şal, îşlik, atlêt, kîlot*, hwd. Di vê mînakê de her çiqas krîtera perçe tevahî hebe jî, yanê kinc wek navê grubê û nêr, û endamên vê grubê *wek cakêt, îşlik, atlêt*, hwd. jî wek mê divê were senifandin jî, lê ji ber krîtera serêkvebûnê kirîtera têkiliya tasawurî ji ya perçe tevahî girantir hatiye. Dîsa bêjeya “şar/şarpe” çima bi jinan re ji hêla tasawurî ve di nav têkilîyeke zexm de ye loma jî mê ye. An na ew jî wek cureyên din yên kincan divê nêr biba.

Dîyarkirina zayenda navdêran di Kurmancî de bi giranî bi krîterên me’neyî ve têne kirin. Ji bo vê jî pêşî navdêr li bin du beşan têne senifandin; navdêrên jîndaran û yên nejmîndaran. Navdêrên jîndar wek yên nêr, mê û yên cotzayend têne senifandin. Navdêrên nejmîndaran jî wek nêr û mê têne senifandin. Yên nêr li gor krîterên pozîtîf; yên mê li gor krîterên pozîtîf û li gor krîtera bermayîyên me’neyî ve yên din ve têne senifandin. Eger di tabloyekê de ev sîstem bê dayîn wê wiha be;

Tablo 2: Di Kurmancî de Sîstema Dîyarkirina Zayenda Navdêran bi awayekî Me’neyî ve

Navdêrên Jîndaran			Navdêrên Nejmîndaran	
Nêr	Cotzayend	Mê	Nêr	Mê

Însan	Neînsan	Însan	Neînsan	Însan	Neînsan	Krîterên Pozîtîf	Krîterên Pozîtîf	Bermayîyên Me'neyî
Sinan, xalo, bira, ...	Beran, dîk, nêreke, ...	Heval, doxor, seyda, ...	Gur, ker, kew, ...	Elîf, xaltî, xwişk, ...	Mih, Mirîşk, manker, ...	çîya, penêr, dest, ...	deşt, ax, mêş, ...	radio, înternet, organîzasyon, ...

Wextê ev krîterên li jorê li navdêrekê bêne tetbîqkirin û dîsa jî zayenda navdêrê bi awayeke rast dernekete pêşberî me, wê çaxê yan ev navdêr bi awayeke morfolojîk tê dîyarkirin an jî di dewreke dîrokê ya nedîyar de wê navdêrê zayenda xwe ji ber hin sedemên nayên zanîn guherandiye.

2.2. Sîstema Morfolojîk ya Dîyarkirina Zayenda Navdêran

Di dîyarkirina zayenda navdêran de li pey taybetîyên me'neyî yên navdêran, rêya duyem ya dîyarkirina zayenda navdêran taybetîyên şiklî yên navdêran e. Ev jî li bin du serenavan tê nirxandin; taybetîyên morfolojîk û yên fonolojîk. Taybetîyên fonolojîk di dîyarkirina zayenda navdêrên Kurmancî de xwedîyê tu bandorê nînin (Haig û Öpengin, 2014a: 4). Loma jî wê tenê li ser taybetîyên morfolojîk bê sekinîn.

Sîstema morfolojîk her wext bi sîstema semantîk ve eleqedar e. Mesela, di gelek zimanan de , me'na biçûkkirinê wextê li bêjeyekî tê zêdekirin, ev xwe di qada morfolojîk de jî nîşan dide. Di Kurmancî de jî sîstema morfolojîk di sê cihan de li ser dîyarkirina zayendan bandordar e. (1) wextê navdêrekê bi paşgira {-î} / {-tî} / {-anî} / {-ahî} ve me'neya razberîyê bi dest dixê; (2) wextê lêker dibine navdêr û (3) wextê navdêr paşgirên biçûkkirinê hildidin. Di van her sê rewşan de jî navdêr di nav senifa zayenda mê de cih digirin (Haig û Öpengin, 2014a: 5; Bedir Han û Lescot, 2005: 68).

Mînak ji bo kirîtera ewil (1); *mêr-anî*-ya te, *kur-tî*-ya wî, *xirab-î*-ya wan, *egîd-î*-ya wî kirî, hwd. Qismek ji van navdêran her çiqas navdêrên nêr bin jî çima paşgira {-î} / {-tî}yê girtine, loma jî bûne mê.

Mînak ji bo kirîtera duyem (2); *hatin-a* te, *birin-a* te, *çûyîn-a* te, hwd. Ev navdêr ji lêkeran hatine çêkirin û hemû navdêrên ji lêkeran hatî çêkirin mê ne.

Ji bo kirîtera sêyem (3) divê pêşî paşgirên biçûkkirinê yên Kurmancî bêne zanîn; {-ik}: *mêr-ik*, *jin-ik*, *berx-ik*, *zar-ok*... hwd. Di vê derê divê ev were gotin ku navdêrên bi awayekî leksîkî nêr in her çiqas paşgira biçûkkirinê bigirin jî dîsa nêr dimînin; *wek*, *mêrik*, *kurik*, ...

{-îvk}, {-îfk} / {-îşk}: *gul-îfk*, *germ-îşk*, ... hwd.

{-o}, {-ok}, {-oke}: *mirov-ok*, *axa-yok*, ...hwd.

{-olek}, {-olik}: gul-olik, çînc-olik, ...hwd.

{-or}: gul-or,hwd.

{-onek}: tirs-onek, (Bedir Han ve Lescot, 2005: 289). Di vê derê de ev navdêr dikare refereyê herdu zayendan bike. Loma jî divê bi krîterên navdêrên cotzayend ve zayenda wê were dîyarkirin.

2.3. Sîstema Dîyarkirina Navdêrên Qerzbûyî

Li ser sîstema dîyarkirina navdêrên qerzbûyî gelek hipotez hene. Lê gelek ji van hîpotezan li ser bîngê saxlem nehatine danîn. Sîstema herî rehet û bî bîngê ew e ku wextê navdêrê ji zîmanekî din tê qerzkirin, li gor sîstema zayendê ya zîmanê qerzhildayî zayenda xwe digire (Corbett, 1991: 71). Mesela, her çiqas bêjeya “hubr”ê di Erebi de nêr be jî di Kurmancî de mê ye. Dîsa bêjeya “şîmendîfer” di Fransîzî de her çiqas nêr be jî di Kurmancî de mê ye. Nexwe dikare were gotin ku zayenda navdêrên qerzbûyî li gor sîstema dîyarkirina zayenda zîmanê qerzhildayî dîyar dibe.

Mijareke din ya di sîstema dîyarkirina zayenda navdêrên qerzbûyî de mijara analojîya semantîk (semantic analogy) e. Yanê hin caran ji zîmanên din hin bêje qerzdibin lê ev bêje di zîmanên qerzhildayî de hene (Corbett, 1991: 75). Mesela, “rûn, kum û derî” bêjeyên xwerû Kurmancî ne. Lê di hin devokên Kurmancî de di ber van bejeyan de wergerên wan yên Tirkî yên “yax, şepqe, û qapî” jî têne bikaranîn. Ev bêje çîma di Kurmancî de nêr in loma jî wergerên wan yên Tirkî jî wek nêr hatine senifandin.

Her çiqas sîstema zîmanê qerzhildayî zayenda navdêra qerzbûyî dîyar bike jî, hin caran navdêra qerzbûyî zayenda xwe ya zîmanê qerzdayî diparêze. Mesela, bêjeya Fransîzî ya “cache-nez” ya nêr wek “kaşne” derbasê Rûsî bûye. Li gor sîstema dîyarkirina zayenda navdêran di Rusî de divê ev navdêr notr ba, lê ev navdêr di sedsala nozdehemîn de di Rûsî de wek nêr dihate bikaranîn. Sebebê vê jî li gor Thomas (1938: 169) zivirîna kodan (code-switching) e. Ev rewş di gelek civatên cotzîmanî de heye (Corbett, 1991: 80). Gelo ev rewş dibe ku di Kurmancîya civatên Kurmancan yên axêverên hem Erebi hem jî Kurmancî de hebe. Lewra di Erebi de jî zayenda navdêran heye. Lê lewra Kurmancên Tirkîyê, Tirkî wek zîmanê duyem bikar tînin ku di Tirkî de zayenda navdêran tune ye, loma jî em nikarin behsa rewşeke wiha ji bo civata Kurmancên Tirkîyê bikin. Ev xebateke berfirehtir dixwaze, loma jî dervayê sînorê vê gotarê ye.

2.4. Sîstema Dîyarkirina Zayenda Navdêrên Pirjimar Kêşandî

Senifandina navdêran di Kurmancîya Standart de tenê wextê navdêr bi awayeke yekjimar têne kişandin dertê meydanê. Lê navdêr wextê bi awayeke pirjimar têne kişandin, maruzê tu senifanidinekê nabin. Lê di hin zîmanan de wextê navdêr bi awayeke pirjimar têne kişandin maruzê senifanidê dibin. Ev rewş di

Erebî de heye. Navdêrên Erebi bi awayeke cotjimar û pirjimar dibine pirjimar. Mesela eger bêjeye “معلم muellim” (mamoste) ya nêr û bêjeya “معلمه muellime” (mamoste) ya mê bi awayeke cotjimar û pirjimar werin kişandin wê wiha be (Hamdelsayed, MA û Atwell, 2016);

(1) “معلم muellim” (mamoste) (Nêr)

Yekjimar	Mamoste (Nêr)	معلم	muellim
Cotjimar	Du mamoste (Nêr)	معلمين / معلمان	Muellimîn/muelliman
Pirjimar	Mamoste (pirjimar) (Nêr)	معلمين / معلمون	Muellimîn/muellimûn

(2) “معلمه muellime” (mamoste) (mê)

Yekjimar	Mamoste (mê)	معلمه	Muellime
Cotjimar	Du mamoste (mê)	معلمتان	Muellimetan
Pirjimar	Mamoste (pirjimar) (mê)	معلمات	Muellimat

Her wekî ji vê mînakê jî tê dîtin, di hin zimanên dunyayê de wextê navdêr bi awayeke pirjimar têne kişandin dikarin li gor zayenda navdêrê cuda werine kişandin.

Di devokeke Kurmancî ya Qafqasyayê⁹ de navdêr wextê pirjimar têne kişandin jî marûzê senifandineke cuda dibin. Her wekî li jorê jî behsa wê hate kirin, navdêr ne tenê li gor zayenda xwe ya bîyolojîk lê li gor hin krîterên wek, însan-neînsan, jîndar-nejîndar, ... hwd. jî dikarin marûzê senifandinan bibin. Di vê devoka behskirî de wextê navdêr di nav avanîya îzafeyê de bi awayeke pirjimar têne kêşandin, li gor însanbûn û neînsanbûnê paşgirên cuda digirin. Navdêrên însanan û endamên laşê însanan pagira {-ên} dîstînin û navdêrên neînsanan jî paşgira {-êd}ê distînin.

Berîya mînakên vê bêne dayîn, divê behsa paşgirên pirjimarîyê yên Farisî bê kirin ku hema bêje wek hev e li gel senifandina li paragrafa jorîn de behsa wê hatiye kirin. Wextê navdêr di Farisî de bi awayekî pirjimar têne kişandin, paşgirên {-ha} û {-an}ê distînin. Paşgira {-ha}yê dibe ku li pey hemû navdêran bê bikaranîn. Lê paşgira {-an}ê li pey navdêrên însanan wek “doxter-an” (keç. Pirjimar), “nivîsendeg-an” (nivîskar. Pirjimar); pey navdêrên heywanên mezin wek “esp-an” (hesp. Pirjimar); pey endamên laşê însanan wek “leb-an” (lêv.

⁹ Di vê beşê de wê ji bo vê devokê ji pirtûka Emerîkê Serdar ya bi navê “Êdî Dereng Bû” mînak bêne dayîn.

Pirjimar), “çeşm-an” (çav. Pirjimar) û pey hin navdêrên din yê edetî wek “soxen-an” (gotin. Pirjimar), “axtar-an” “setereg-an” (strêrk. Pirjimar) tê bikaranîn (Perry, 2007: 980).

Cudahîya paşgirên pirjimar yê di Farîsî de, nîşan dide ku di zimanên Îranî de senifandineke din ya li ser însanbûn û neînsanbûnê hatîye avakirin heye. Mînakên vê senifandinê di Kurmancî de jî heye ku mînakên ji Pirtûka Emerîkê Serdar ya bi navê “Êdî Dereng Bû” bi vî awayî ne;

Mînakên paşgira {-ên}ê ku pey navdêrên însanan, endamên laşê însanan tê bikaranîn:

çavên te (r. 147), *çogên* xwe û *lingên* xwe (r. 193), *lingên* min (r. 211), *neferên* malê (r. 154), çend *lawikên* me (r. 155), *birayên* hev (r. 156), *zarên* wî (r. 159), *nasên* wî yê nezîk (r.160), bi *merivên* kesîb re (r. 160), ew her sê *cîranên* me (r. 161), rehet li *çûyîyên* we be (r. 188), *gundîyên* me (r. 191), *zarên* xwe (r. 193), çî qas *merivên* şêher î zane (r. 195), *xapxapokên* wisa (refereyê însanên xerîb dike) (r. 195), jî *zarên* xwe (r. 206), çend *kulfetên* cîran (r. 209), *pêşîyên* min (r. 213).

Her wekî jî van mînan jî tê dîtin, navdêrên însanan û navdêrên endamên laşê însanan di nav avaniya îzafeyê de bi awayekî pirjimar hatine kişandin û paşgira {-ên}ê standine.

1. Mînakên paşgira {-êd}ê ya jî bo navdêrên neînsanan tê bikaranîn.

şîrêd xwe (kendi şîirleri) (r. 147), *destlihevixistinêd* haziran (r. 148), di *salêd* 30î de, pakêteke *şîrêd* Etar î teze (r. 150), *qanûnêd* nivîsarî (r. 152), *poemêd* Etarê Şero yî tezenivîsî (r. 155), *efirandinêd* wî (r. 155), *fîkrêd* cure bi cure (r. 155), ev *bîranînêd* biçûk (r. 157), *mecalêd* vekirina wan (r. 159), tu gilî û *gotinêd* mayîn (r. 164), *tekerêd* wan, *tekerêd* pêşîn (r. 166), *îzbatîyêd* konkrêt (r. 175), *qewimandinêd* bûyî (r. 182), qise û *mijûlîyêd* xweş (r. 182), *salêd* axirîyê, *rojêd* zarotîya min (r. 207), di nava *bîranînêd* min de (r. 209).

Her wekî jî mînakên jorîn jî tê dîtin navdêrên neînsanan paşgira {-êd}ê ve di nav avaniya îzafeyê de bi awayekî pirjimar hatine kêşandin.

Her çiqas ev senifandina me behskirî hebe jî di hin cihan de ev krîter hatiye binpêkirin wek; di nava *kaxezên* min î nivîsar de (r. 153), te çî anîye serê *şîrêd* min (r. 149), çend *gilîyên* tûj (r. 156), çiqas *hereketên* min (r. 156), çend dest *kincên* zaran î teze (r. 163), çend *melumanîyên* di der heqa kuştî û *tekerên* avtomaşînê de (r. 159), vê gavê *pîrsên* min tune ne (r. 162), li ser van *xeberên* xwe yî axirîyî (r. 166), Van *gilîyên* han (r. 182), *şevên* payîzan û zivistanan î dirêj (r. 182), *dewetên* gundê me (r. 211).

Bêjeyên jorîn her çiqas neîsan in û divê bi paşgira {-êd}ê ve bibine pirjimar jî, ew bi paşgira {-ên}ê ve bûne pirjimar. Ji bo van îstîsnayan em dikarin vê bêjin;

di serî de, her wekî li jorê jî hate dîtin bêjeya Farisî ya (soxen-an) (gotin. Pirjimar) di nav gruba navdêrên însanan de cih gitibû. Wextê em li van îstîsnayên jorê dinihêrin em dibînin ku piranîya van bêjeyan bi gotinê ve eleqedar in; me'lumanî, pirs, xeber, gilî. Dîsa, her wekî li jor hatîye behskirin, hin krîterên dîyarkirina zayenda navdêran dibe ku bibe sebep grubên zayendan berfireh bin an jî teng bin. Loma jî ev îstîsna dikarin werin tolerekirin.

Çawa ji gruba {-ed}ê hin navdêr derbasî nav gruba {-an}ê bûne, her wekî wê rewşa dijber jî pêk hatiye. Mesela, “di nav civateke sêksîya *nivîskarêd* Kurdan de (r. 155), ez ew qasî jî *zarêd* xwe hez dikim (r. 206).” Ev îstîsna jî her çiqas zêde nebin jî dîsa bi firehbûn û tengbûna senifa zayendê ve dikare were terîfkirin.

Encam

Sîstema dîyarkirina zayenda navdêran di hin zimanan de gelek zehmet e lê di hinekên din de nîsbeten kêmtir kompleks e. Kurdîya Kurmancî ji wan zimanên xwedîyê zayenda gramatîk e. Di vê xebatê de li ser sîstema dîyarkirina zayenda navdêran hatîye sekinîn û hatîye îddîa kirin ku bi vê sîstemê ve zayenda hemû navdêrên Kurmancî bi awayeke mantiqî dikarin bêne dîyarkirin. Yanê bêjeya “mase” çima mê ye û bêjeya “ling” çima nêr e, bi vê sîstemê bersiva van pirsan hatîye dayîn. Dîsa di vê xebatê de li ser zayenda navdêrên bi awayekî pirjimar kêşandî hatîye sekinîn û di devokeke Kurmancî ya Qafqasyayê de senifandineke li ser însanbûn û neînsanbûnê avabûyî hatîye tespîtkirin.

240

Her çiqas hin xebat li ser sîstema dîyarkirina zayenda navdêran di Kurmancî de hatibin kirin jî hin ji wan ne sîstematîk in û hin ji wan jî tenê li ser sîstema zayenda navdêrên jîndaran sekinîne. Bi taybetî sîstema zayenda navdêrên nejîndar ji hêla gelek nivîskaran ve wek mijareke tevlihev hatîye dîtin. Di vê xebatê de, bi rêberîya xebata Corbett (1991) ya bi navê “Gender” ve krîterên ji bo sîstemên dîyarkirina zayenda navdêran yên zimanên dunyayê yên xwedîzayend ji bo Kurmancî jî hatîye tatbîqkirin. Di encamê de sîstemeke bi rêk û pêk hatîye destxistin ku ev sîstem armaca vê xebatê bû.

Ev sîstema hatî behskirin dibe ku ji hin aliyên xwe ve kêm be an jî hin xeletî di nav de hebin. Bi taybetî senifandina navdêran bi wayeke pirjimar kêşandî mijareke nû ye ku li lîteratura xebatên Kurdolojîyê zêde bûye. Loma jî pêdivî her cure xebatan heye ku li ser vê mijarê ve eleqedar ku kêmasîyên vê xebatê nîşan didin an jî tiştên nû li vê mijarê zêde dikin. Dîsa, hemû bêjeyên zimanê Kurdî yek û yek nehatine analîzkirin lê sîstem pêşî hatîye dayîn û paşê ziman di nav wê sîstemê de hatîye bicîhkirin. Dibe ku ev wek problemeke metodolojîk were dîtin lê bi me ev sîstema han eger bi awayeke rêk û pêk were fêmkirin û were tatbîqkirin bo navdêrên Kurmancî, wê were dîtin ku ji bo dîyarkirina zayenda navdêran sîstemeke gelek bibandor e. Wek dawî dikare were gotin ku divê konsepta dunyayî ya axêverên Kurdîya Kurmancî were zanîn. Xebateke kûrtir ya ku bêjeyan hemû analîz dike wê hem fêmkirina konsepta dunyayî ya

Kurdîya Kurmancî derxe meydanê hem jî wê hêza vê sîstema hatî pêşxistin nîşan bide.

Çavkanî

- Adak, A. û yên din. (2016). Fêrkera Kurdî (Asta Destpêkê). Mardin: Mardin Artuklu Üniversitesi Yayınları.
- Akin, S. (2005). Têkçûna Zayendê di Zaravayê Kurmancî de. Dinav Gotarên Konferansa li ser Zimanê Kurdî. İstanbul: Weşanên Înstîtuya Kurdî ya Stenbolê.
- Bedir Han, C. û Lescot, R. (2004). Kürtçe Gramer. (Paris Kürt Enstitüsü Gözetiminde Türkçeye Çevirilmiştir.) İstanbul: Avesta Yayınları.
- Bingöl. İ. (2019). Zazaca Ders Notları 1. (Yayımlanmamış Ders Notları).
- Braun, F. & Haig, G. (2019). When are German 'Girls' Feminine? How the Semantics of Age Influences the Grammar of Gender Agreement. Bieswanger, Markus, Motschenbacher, Heiko & S. Mühleisen (Ed.). Di nav Language in its socio-cultural context: New explorations in global, medial and gendered uses. (1-12). Tübingen: Narr.
- Corbett, G. (1991). Gender. Cambridge: Cambridge University Press.
- Ekici, D. (2007). Kurmanji Kurdish Reader. Hyattsville (USA): Dunwoody Press.
- Gruba Xebate ya Vateyî. (2013). Ferheng/Sözlük (Türkçe-Kırmanca / Kırmanckî-Tirkî). İstanbul: Weşanxaneyê Vateyî.
- Haig, G. (2000). The Gender System in the Kurdish Language: Structural and Sociolinguistic Aspects. Musweddeyeke ji komxebata Kurdish Gender Studies ya li Katowê û ji xebata di navbera dîrokên 23-25.09.2000 hatî kirin. Ev gotar bi Almanî; Haig, G. (2004). Das Genusssystem in der kurdischen Sprache: strukturelle und soziolinguistische Aspekte. Hajo, S. Borck, C., Savelsberg, E. & D. Şukriye (Ed.). di nav Gender in Kurdistan und der Diaspora (33-58). Münster: Lit.
- Haig, G. & Öpengin, E. (2014a). Gender in Kurdish: Structural and Socio-cultural Dimensions. Hellinger, M. & H. Motschenbacher (Ed.). Di nav Gender Across Languages Sayı IV, (247-276). John Benjamin.
- Haig, G. & Öpengin, E. (2014b). Regional Variation in Kurmanji: A Preliminary Classification of Dialects. Di nav The Journal of Kurdish Studies S. 2, No. 2, (143-176).
- Haig, G. & Öpengin, E. (2014c). Kurdish: a Critical Rresearch Overview. Di nav The Journal of Kurdish Studies, j. 2, No. 2, r. (99-122).
- Hamdelsayed. û Atwell. (2016). Using Arabic Numbers (Singular, Dual, and Plurals) Patterns To Enhance Question Answering System Results. Di nav IMAN'2016 4th International Conference on Islamic Applications in Computer Science and Technologies (20-22 Dec

- 2016). Dîroka Gihîştinê: 05.04.2019, (http://eprints.whiterose.ac.uk/112954/1/a_dany16iman.pdf)
- Hoffmann, K. (2012). Avestan Language i-iii. Di nav *Encyclopædia Iranica*, III/1. (47-62). Dîroka Gihîştinê (03.04.2019), <http://www.iranicaonline.org/articles/avestan-language>
- Kerim, A. H. (2019). Di Zimanê Kurdî de Zayendê Bizavdar (Mobîl). Dîroka Gihîştinê: 11.03.2019, <http://dirokakurdistan.com/krd/wp-content/uploads/2018/11/Zayenda-mobil.pdf>
- Komxebata Kurmancîyê. (2016). Rêbera Rastnivîsînê. Dîyarbekir: Weqfa Mezopotamyayê.
- Kurd, K. (2011). *Zayenda Mê û Nêr (Masculine and Feminine Genders in Kurdish Grammar)*. Berlin: Free University of Berlin Publishers.
- MacKenzie, D.N. (1954). Gender in Kurdish. Di nav *Bulletin of the School of Oriental and African Studies* 16/3 (528-541). London: University of London.
- Malmîsanij, M. (2015). *Kurmanca ile Karşılaştırmalı Kirmanca (Zazaca) Dilbilgisi*. Vate Yayınevi: İstanbul.
- McConnell-Ginet, S. (2011). Gender and Its Relation to Sex: The myth of 'Natural' Gender. Corbett, G. G. & De Gruyter. (Ed.). Di nav *The Expression of Gender*. Dîroka Gihîştinê: 04.02.2019 <http://ebookcentral.proquest.com/lib/ub-bamberg/detail.action?docID=1121623>.
- Perry, R. J. (2007). Persian Morphology. Alan S. Kaye (ed) di nav *Morphologies of Asia and Africa*, Eisenbrauns. Dîroka Gihîştinê: 20.03.2020. https://www.academia.edu/42846867/Persian_Morphology
- Sadinî, M.X. (2011). *Feqîyê Teyran (Jîyan, Berhem û Helbestên Wî)*. İstanbul: Weşanên Nûbiharê.
- Samûr, A. (2012). *Kurdîya Kurmancî*. Stenbol: Weşanên Nûbiharê.
- Serdar, E. (2015). *Êdî Dereng Bû*. Dîyarbakır: Weşanên Lisê.
- Şakiro. Ferzende Beg. Dîroka Gihîştinê: 11.10.2018, <https://www.youtube.com/watch?v=IIdTfTPr3Uw>
- Şakiro. Sînem. Dîroka Gihîştinê: 01.09.2018 <https://www.youtube.com/watch?reload=9&v=IWgyAPA6dJU>
- Tan, S. (2015). *Rêzimana Kurmancî*. (3.Baskı). Stenbol: Weşanên Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê.
- Taş, Ç. (2013). *Waneyên Rêziman û Rastnivîsa Kurmancî*. İstanbul: Weşanên Dîwanê.
- Tîrêj, S. (2014). *Dîwan (Xelat – Zozan – Cûdî)*. Remezan Alan (Redeksîyon). İstanbul: Peywend.
- Yildiz A. û Taşkin H. (2018) *Şakiro (Kewê Ribat)*. İstanbul: Weşanên Nûbiharê.